PÊLEK JI DERYAYÊ KOVANÊN MIN

DIYA CIWAN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV. K.L. 239
922 CIW PEL

PÊLEK JI

DERYA YÊ KOVANÊN MIN

Institut kurde de Paris

DIYA CIWAN

Derhênan: Bavê NARÎN

berge û wêneyên hindur:

JIYAN Şûzî

Institut kurde de Paris

Diyarî..

Ji

wan dayikan re..

yên ku

herroj..

bi zolikên

kezeba xwe

birînên welat

pîne dikin...

Diya Ciwan

* * * *

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

SIPASÎ

Sipas ji
wan kesan re,
ên ku
gavekê torê
bi pêş ve didin...
Spasiyek taybetî ji

«Bavê NARÎN» re...

ji wî Kesê ku
bi merdî,bê ezîtî;
alîkare, ji bo
her kesên ku
li tora kurdî
dibine xwedî...

Diya Ciwan

* * * *

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

PÊŞGOTIN

Pêl li dûv pêlê... li pey hev... pala xwe li hev didin... û diçin... dûr diçin... vedgerin... vedzelin... tevlî hev dibin.. û bi hev re dibin deryayeke mezin..bin-av dibin..ser-av dib in.. xemsar dibin... û radizin.

Tîrêjên tavê yên germ û zêrîn... hêdî–hêdî... bi dilovanî destên xwe li ser wan dipelînin... surra bayê spîdê li riwê wan dide.. bi niyazî çarika reş ji ber çavên wan hildike...

Beşek ji wê ava fireh, tihin bi laşê wan dikeve.. ji xewa giran şiyar dibin... çavên xwe mist didin... vedikin... li dora xwe dinêrin... hêz didin xwe... li ser piyan radibin... xwe bi serê tiliyên tîrêjên tavê digrin... bi wan re ber bi asoyeke dûr diçin û diçin...

Mîna girikinî piçûk... bi kêferateke bê rawestan dixwazin xwe bighînin kilora rokê... rok jî hin bi hin ber bi ava diçe.. tîrêjên wê zirav dibin.. qels dibin.. têne birrîn û.. winda dibin.

Institut Kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Pêlên kêm hêz... naçar dimînin.. bê hêvî dibin û dîsa di derya yê de wer dibin...

Şev dîsa kirasê xwe yî reş li ser wan vedigre...pêl, bihnekê radiwestin... vedzelin..Bin-av dibin..lê çavên wan nayête girtin... bendewarên hêviyekê... çirîskekê delavekê ne...

Riwê deryayê bi yekser rast û mend dibe... hawîr dor ker dibe...

Hindek pêlên ji hevketî.. hêza xwe didin ser hev... bi hev re didin û distînin... bi çareyeke nû diramin...li dûr dinêrin...

Çirîskeke zîvînî... bi payetî ber bi wan ve tê... pê li reşiya şevê dike... wê li ber xwe tajo...

Şev weke diza sernixûz dibe...bi kerrêtî.. bê deng direve... ji tirsa roniyê... ji tirsa rastiyê... xwe berdide hundurê qul û şikeftan... tê de dilûse... xwe vedişêre... li benda çûna heyvê... çûna roniyê dimîne... da ji nû ve li cîhanê belav bibe... diz û pêxwas û herçî kesên ji roniyê çav- şikestî himbêz bike û wan çav-sor û gurêxî aştî û rastî... qencî û evîniyê bike, da wan ji kokê de

Institut kurde de Paris

hilke....

Pêl... serê xwe radikin.. li xwe dizîvirin... dîsa şipya radiwestin... toza westana roja bûrî vedweşînin... borîn bi wan dikeve... diqûrin... ban hev dikin... ba li ser dengên wan şiyar dibe... di gaziya wan ve tê.. piştgiriya wan dike... û wan ber bi çirîska heyvê ve dibe...

Perrê derya li pêş wan numa dibe... mêrg û çîmen... deşt û çiyan ji dûr dibînin... riwê pêlan geş dibe... digirnijin... bejna xwe bilind dikin... bi êrîşeke xurt ber bi rizgariyê ve diçin... dema nizîkahiyê li rêzgariyê dikin... ordiyeke ji tehtan... lek bi lek li pêşiya xwe dibînin..

Bê tirs bi hinereke xurt.. xwe li bin guhên wan tehtan didin.. her carê piçekî ji wan diheşêfin... hûr dikin da hin bi hin rêçine azadiyê ji xwe re vekin.

Pêl diwestin... bi şûn ve vedgerin... çavên wan her li wê xaka dûr dimîne...

Dîsa li ber xwe didin... çawa diçin...çawa dinêrin kelemin astengin... sînorin...

Institut Kurde de Paris

Karekî dijware... xebateke dûv–dirêje...

Pirraniya pêlan xwe noqî binê deryayê dikin... çarika xemsariyê bi ser çavên xwe de wer dikin, di newala xewê de wer dibin û... dinivin.

Rojin dirêj dibûrîn, rewş ew rewşe... meh û sal dibûrin... ew rewşe..

Her ku çend heyam dibûrin... hindek pêl ji ser wan teĥtan dipengizin... bilind dibin û li rexê dî li bin guhê latan dikevin... ava wan bela–wela dibe... kêm hêz dibin... di koncalan de dimînin...

Hin ji wan hêzê didin xwe... dîsa radibin... bi rê ve diçin... dilukumin... dikevin... bi zikxişkî xwe dighînin rexê dî..

«PÊLEK» ji wan ji dûr... gelekî dûr tê... li vê rewşê dinêre.. lerzek dikeve laşê wê... rondik di çavên wê de dileyizin. Hêrsek hate wê.. raperiya... toza rewiştên kevin daweşand... li pêşiya xwe nêrî.. cîhaneke diye.. bi hûrbînî li wê xweristê nêrî... darin şîn û hin hişkin... çima... !?

Avahîne dû qat sê qat... û xanîne ji depan ji axê... holikin piçûk çima... !?.

Institut kurde de Paris

Tîq–tîqa kenên hinan û kûr–kûra giriyên hinan... çima... çima... û.. çima ?..?.

Pirsin weha û bêtir... di serê wê de gerihan... ev çi rewşe.. ? çi cenge ku li rexê dî dibe... !?

Kûr–kûr ramiya, bi encamekê derket.. ku divê here û ji qalikê xwe bête der...

Deste vala.. bê çek.. bi tenha... bê alî-karî... berê xwe da jiyaneke nependî...

Ew sînorên ji tehtan, li pêşiya wê jî rawestiyan.. lê nebûn kelem... ne jî asteng di ber vîna wê de...

Dît ku serê xwe li tehtan xîne serhişkiye...

Êdî divê xweş birame... û li rêçeke durist bigere ... da bi serbilindî û bi gavinî rast xwe bighîne rexê dî... û dê bi çi rengî rê ji xwe û hevalên xwe re veke û xweş bike.. ? û hêdî hêdî wan sînoran ji navbera xwe û rexê dî rake...

...Ji pêlan ev pêl, di cihê xwe de bimîne, ziyaneke mezine...

Herê... Pêleke... Lê pêleke ne wek pêlane.

Institut Kurde de Paris

Pêleke dilovane... gemiyan bin-av nake... masiyan li tehtan naxîne...

Pêleke bi evînê, şerê kîn û rik û bêbextî û zikreşiyê dike... gavên xwe hûr-hûr... bi zanebûn û bi bawerî dihavêje..

Kûr dirame, armançine bilind di jiyana xwe de, û ji bo jiyanê nîgar dike...

Li dûr dinêrî... herçend roj derbas dibûn.... ewçend xwe bi raman û sinc û zanînê radipêça..

Nava pêlê keliya... keliya... serê xwe rakir... li dûr nêrî... û Bi vîneke tund... bi ramaneke durist... bi sinceke bilind... xwe di ser tehtan re hilavêt... û xwe gihande rexê dî... Ranewestiya... her bi pêş ve çû..

Li ser qadeke nû... qadeke tijî raz û sawîr, bê tirs, lingê xwe danî...

Bi rêket... ber bi dareke hişk ve çû... di bin de rûnişt... guhdarî derdê wê kir... rondikên pêlê hatin xwar... li dora darê bûne gol.. riwê darê geş bû... sipasiya pêlê kir.. pêlê nasî, ku dermanê wê ave...

Herweha... nasî ku dermanê birçiyan jî nane... yên girtiyan tave.. avakirina malekê

Institut kurde de Paris

xebat û kare... û çiya ji bindestan re alîkare...

Diçe û tê.. digerihe... naweste.. li dora xwe dinêre... li hêleke dûr qadek beyar û fireh dibîne... berê xwe didiyê... li nav digere, birçî dibe... bi vir de tê, bi wir de diçe... hindek şênkahî di goşeyeke piçûk de ji wê qada fireh dibîne...

Berê xwe didiyê... li nav wê digere... wan dipelîne... li wan dinêre... darên mêwane... pincarin... stirîne...

Libinî meyweyan dibîne... destên xwe tavêjê... dixwe... hîn kerikin... şêranî di wan de tuneye... û hin ji wan pûçin... radibe tovê xwe, bê renc, tê de wer dike... şîn dibin.... mezin dibin... ber jî didin... lê dît ku napijin...

Bala xwe da vê goşeya piçûk.. li sedeman geriha... dît ku ji sedên salan ve... ev quncik bi tenê ji vê hola fireh... ta bi îro tête çandin...

Melayê CIZÎRÎ û XANÎ... FEQÊ

Teyran û çendek ji hevalên wan...

Institut kurde de Paris

ji sedê salan ve, hatin û ji xwe re ev quncik bijartin.. axa wê xepartin... paqij kirin... xwihdan li ser rijandin... westehan... dûv re,tovên xwe tê de çandin... tovên wan ber girt... ta bi îro em wan diçinin û dixwin...

Nifişnî dî hatin tovên xwe tê de çandin... bê ku jê re kar bikin...

Her çend roj bûrîn û nifşên nû hatin... tovên xwe tê de werkirin... bê cot... bê xepartin bê xwihdan.. ew çend ev goşe westandin, û axa wê pûç kirin..

Karekî dûv–direj jê re divê da ku dîsa li ser lingê xwe rabe û vejine...

«PÊLÊ» dît ku bê sûde ye... berê xwe jê guhert... û ber bi perçeyekî dîtir ve çû... axa wê ji keviran helbijart.. kêstekên wê şikandin..hûr kirin axa wê xweş kir.. ji avakirinê re amade kir...

Car–caran jî diçe seredana goşeya dî û tê de dixebite...

Eve DIYA CIWAN ez wisa wê dinasim.

– Hêviya min ewe ku hin bên û di evê goşeyê de avahîne bilind çêbikin.. û

Institut Kurde de Paris

perçên herî mezin ji wê qadê jî jibîr nekin.

** Bavê NARÎN **

Şam

7 – 7 – 1992

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Ev pertûk...

Xwendevanên hêja..

Ev pêleke,ji deryayê kovanên mine...

pêleke mişexte...

ji bêhriya bihna axê şewitiye.

Hîn tirsa têl–stiriyên sînoran di dilê wê de ye...

Ev pêl ...

xewneke...

Hêviyeke...

Dê bextiyar bibim ku bi dilê we be...

Diya Ciwan

* * * *

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

DILÊ MIN

Dilê min neynikek bû...

çawa dizîviran din...
ayîna welatê min xweş tê de diyar dibû...

Rahiştinê...

Li bin guhê erdê dan...

kirin sed perçe..

dema li perçên wî nêrîn, dîtin, ku

ji ayînekê,

bûne sed ayîn... !!

Institut kurde de Paris

* * * *

BIYANÎ

tevî sitem û tehliya biyaniyê jî..

deyndarê wê me..

Ji ber ku

ewê bi min da zanîn,

çendî welat

biha

û

şêrîne.

* * * *

Institut kurde de Paris

PIŞTÎ GUNDÊ ME MA VALA

Ho dadê.. De rabe,dîsa rabe... sibehê zû porê minî dirêj bişkine... û keziyên min bi wan destên xwe yên dilovan.... hûr–hûr bihûne...

Ho pîrê..

De dîsa rabe, nivêja sibehê bike, û sîloka nîskê ji kuflet re li êgir bike...

Ho xalê E'lo..

Were.. barê genimê me bibe êş, û bêje aşvan, bila genimê me zû bihêre.. ji ber ku ji hevîrekî pêve arvan di mala me de nemaye.

Ho keko..

Rabe ser xwe û binêre.. şevê dî çiqas berf hatiye... de rabe berfîtkê bibe û here serê ban, berfê ji ser bavêje, em ditirsin ku ban bi ser me de hilweşe.

Ho mamo..

Rabe, mizgîniya min li te; mehîna me ya boz, di bin o'lyê de zaye, û berê wê, nêr hatiye

Ho xwişkê..

Rabe, em rahêjin cerên xwe, da em herin

Institut kurde de Paris

ser Kehniyê, berya ku berf bihile û ava me şêlo bibe.

Ho pismamo...

Rabe goreyên xwe yên hirî bikşîne lingên xwe.. û pezê xwe derêxe êxûzê.

Ho oo şivano...

De rabe dîsa pezê xwe derxe ber–beroja, rahêje billûra xwe, û qîrke awazên folklorî û... Ehmedê mala Mûsa.. Şêxa dînê... Dotmam... Canê bibêje.

Lo şivano, ez di bextê te de me bibêje... bibêje... û her bibêje... ta dengê te here bikeve hemî malên gundê me de... belkî, belkî, bi dengê billûra te, dilê gundê me dîsa lêxîne, û rehên jiyana wî bi jene... û vejine.

Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

XWEZÎ EZ...

Xwezî ez bibama şûrekî tazî, da min serê herçî kesên xêrnexwaz û zikreş– bê dilovanî– jê bikira.

Xwezî ez bibama werîsekî hilawistî, da ez biketama qirika herçî kesên bê bext û bikirên peyva

Xwezî ez bibama pêteke agir, û min xwe li riwê herçî kesên durû xista û tu rû ji wan re nehişta.

Xwezî ez bibama goristaneke mezin, da min herçî kesên qirêj û gemar bi yek carî daqurtanda.

Xwezî ez bibama muhrika xewê da ez biketama guhên herçî kesên li pişt dîwar û deriyan, guhdarî derdên xelkê dikin.

Xwezî ez bibama kehniyek ji xwînê da min xwe berda rehên wan lehingan, yên ku bi xwîna xwe dara azadiyê av didin.

Xwezî ez bibama kevokeke sipî da min nameyên aştiyê di navbera xelkê de bibra û b' aniya.

Institut kurde de Paris

Xwezî ez bibama pênûsek, da

min bi nîvîsanda....

li ser rastiyê,

min binivîsanda

li ser

mêraniyê...

netewiyê...

min bi nivî sanda...

li ser

paqijiyê....

dilxwaziyê...

evîniyê,

merdiyê

min bi nivîsanda...

li ser

tehlî û

şêranîyê

min ê binîvîsanda....

Institut kurde de Paris

û min dê bi nivîsanda

û

bi nivîsanda

ta ez ziwa biba ma...

ta ziwa bibama...



Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

EY ÇIYA *

Ez di bextê te de me, ey çiya, vaye dîsa sêwiyên te, berê xwe dane sînga te.

Ey çiya.. ji daran re bibêje, bila îsal zû pel bidin... ji bo wan ji çavên bomban biparêzin.

Bêje berfê, bila zû bihile; ji bo piyên wan ên xwas di nav de netevizin.

Bêje teht û latan... tûtirk û daristiriyan, bila dilovan bin, li wan gozekên wanî tazî.

Bila teyr û tilûr, ji qelşên dar û tehtan derkevin... hilfirin... dakevin... bi zarokan re bileyizin... bistirênin; Ji bo hevalên wan neyên bîra wan.

Bêje pêvok û belalêskan, bila îsal berî demê derkevin; ji bo zarok bi wan şa-bibin û lîstikên wan neyên bîra wan.

Ey çiya.. ji bîr neke, di wan şevên dirêj de... di şikeftan de.. li ber agirê daran, tu serpêhatiyên xwe ji wan re bibêje...

Di dawiyê de, ji bîr neke, Ey çiya, ji wan re bibêje, ku dê û bavên wan, çi peyma ji

Institut kurde de Paris

wan re hiştine.

Ji kuran re bibêje...

Bavên we qutyek tûtina xursê.. ber û bereste..; tifing û rextek berik ji wa re hiştine.

Ji keçan re bibêje;

Diyên we sincek bi nav û deng... dergûşek, ji dara Biyê... bihna nanê tenûrê... awazek ji lîlandinê û, hinek ji hina Mûsilê, û kil û kildan, ji we re hiştine.

Di bextê te de me ey çiya.. sêwiyên xwe bi germî himbêz bike... ji ber ku—xweş dizanim—ji te pêve, kesî wan nîne... !.

1 - 4 - 1991

* * * *

Institut kurde de Paris

---

* Di kovara Xunavê de, hejmar 13 hatiye belavkirin û di kovara Rêgay Aştî û Sosyalizim hejmara (27) sala 1991 ê de belavbûye.

XEWNA MINÎ ZIKMAKÎ *

Ey xewna minî ku bi min re zayî... û bi min re meşext bûyî... û bi min re sêwî bûyî... û digel min şiyar mayî.

Te bi min re peyala tehliyê vexwar, û te xwe di bin sînga min î sar de veşart û te terîşên kirasê minî peritî li xwe pêça, û te dev ji min berneda.

Ey xewna minî zikmakî. ...

Min tu di nava birînên dil de veşart, û min devê birînan li te dirût... û min got :

Belkî... belkî tu di hundir de bimrî û ji te vehesim... lê tu ji min negerihayî... Min dît ku tu di hundirê dilê min de şîn bûyî, û weke çiya yên welatê min bilind bûyî... şaxên te di bin neynûkên min re dane der, û tu di nava gulên kirasê min de derketî, û te cihê xwe di bin qurmên keziyên min de çêkir.

Ey xewna minî her ciwan. ...

Ez pîr bûm,tu pîr nebûyî, çavên min ji girî Westehan û tu ne westehayî, lingên min ji riya dirêj qerimîn û, pêlava min qetiha,... devê min

Institut kurde de Paris

ziwa bû, û laşê min dilerize.... û hîn û hîn tu rêçeke direj û dûr didî pêşiya min.

Ey xewna ku bi min re afirî... Ez êdî bawer dikim, dê temenê min xelas bibe û dê bimrim, tu bi min re namrî, dê tu bimînî, û divê tu bimînî, ta tu destên xwe bavêjî stêrên esmana û wan li ber xwe deynî,

û ta ku tu zanînê di cihê nezaniyê de biçînî.

û ew qada çandî ji mirovan, tu berê wê hilînî, û ta ku tu kevoka sipî ji rekehê derxînî û wê bifirînî... bifirînî....

Belê... divê tu bimînî û dê tu bimînî.

Institut kurde de Paris

* * * *

---

* *Di govara xunavê, hijmara 12 an, Avdara 1991 ê de hatiye weşandin.*

* * * *

EVÎNDARÊ KU EZ DIXWAZÎM

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Evîndarekî ku bizanibe digel min bigrî... digel min bijî û digl min bimrê.

Evîndarekî dixwazim; ku helbestên zarokan ji ber bike... weke min xewna bibîne û xewnên xwe ji min re bixwîne...

Ez naxwazim wek (Harûn) barê durra, ji Hind û Sindê, ji min re bîne... yan jî bi seda cariyan li ber lingên min dîne.

Ez naxwazim pêhlewanekî bi nav û deng, lê ez dixwazim pirpirîkek bi per û çeng.. sipî bi tîrêjên tavê re bikeve hundir... li dora min bizîvirê û mizgîniya xêrê ji min re bênê.

Ez naxwazim şêrekî dev bixwîn, çavê xezalan derîne û ji min re bîne... ez dixwazim, weke çûkekî, her sibeh, li ser girika milê min dîne, û ji min re bixwîne, bi min re pariyê nanê tisî binikilîne... ji wî naxwazim şahneşîna, da ku xelk min ji dûr bibînin.

Ez dixwazim weke her kesî, çar dîwar û banek hebe... yan jî konek... kolek hebe..

Institut kurde de Paris

xwarin çibe... hebe û yan jî nebe.. ne xeme.

Ez dixwazim, gavên wî li gorî gavên min bin...

bihayê baranê bizanibe...

bihayê xwihdanê bizanibe...

bi zimanê gula bizanibe...

wan biçîne

û

neçine.

Institut kurde de Paris

* * * *

ÇEND AYÎN *

Di vê çûn û hatina bi lez û bez de, di nava rehê min de, bi hezaran kes li bin guhên hev û dû dikevin... bêyî ku zanibim ji kuderê tên û bi kû ve diçin.. Bi hezarê ramanan di bihnekî de—bi rêbiwarî—di nava mejiyê min de diçin û tên, bêyî ku yek ji wan cihê xwe tê de çêbike. Bi hezarê helbestan di rekeha sînga min de hene, bi êrîş dixwazin bêne der, lê mixabin, nikarin, ji ber ku di zayîna wan de şehtiyê li wan dabû... Bi hezarên ayînan li ber çavên min diçin û tên... her yek ji wan ayînan xwe li ya din dide... û diheşêfe... tenê çend ayîn hene, li hemî cih û çaxan, li pêşberî min in... heta di tariya şevê de jî, dema mitêlê digrim ser riwê xwe, û çavên xwe digrim, ew ayîn li ber çavên min dîsin... weke çavên gurên birçî di tariya şevên zivitanê de...

Ayînek ji wan ewe... ku dema diya min dew dikiland... hinek nîvişk ji min re datanî ser qetek nanê tenûrê û ji min re digot :

Bilez, here li pişta dîwêr bixwe, ji bo kes te nebîne.

Institut Kurde de Paris

Ayîna dî.. Dema birayê min, ew pertûka min a ku min bi ta û derziyê bi hev ve kiribû, qetand û xiste bin piyên xwe...

Ayînek din.. Dema neh salî bûm di himbêza diya xwe de razayî bûm, Sibehê, dema şiyar bûm min dît ku laşê wê sar bûye, can ji laşê wê cuda bû ye, lê tevlî ku can jî dabû, ewê dev ji min berneda bû, destê wê li ser sînga min *bû...*

Û, ayînek jî...

Ax... xwezî we bi çavên min bi dîta, di şevek reş de, ez li mehîneke boz siwar kirim, û berê min dane oxira min, min li pişt xwe nêrî, dîtina dawî min... tenûr.. tifik... beroşa binê wê tenî... sêpıkên dew... dara mêwê... golika bi kapik girêdayî... û çendek ji heval û hogirên xwe dîtin, hatibûn xatira ji min bixwazin.. keziyên wan reş û dirêj bûn... rastikên wan di nêvî de vekirî bûn.... hêstiran di çavên wan de dileyistin...

Lê bi Xwedê, hîn û hîn min xatir ji wan nexwestiye.

* * * *

---

* Di kovara Xunavê de, hejmar (14) hatiye belavkirin

Institut Kurde de Paris

ÇIYA PERESTIM

Dê nimêj bikim...

ji wî çiyayî re...
ew çiyayê ku tu carî li ber berf û ba û ba-
hozê nalerize, û serê xwe natewîne.

Dê nimêj bikim...

ji wan teht û latan re...
yên ku tu carî eniya xwe ji ber tîr û topên
dijminan nazîvirînin.

Dê nimêj bikim,...

ji wan gelî û newalan re...
yên ku ji cendekên lehingan dagirtîne...

Û dê nimêj bikim...
ji wan dayikan re...
yên ku herroj... bi zolikên kezeba xwe,
birînên
welat
pîne dikin.

* * * *

Institut Kurde de Paris

SÛNDA MIN

Ey çiya...

Sûnda min hîn û hîn bi serê te ye...
hîn jî Ïhina bûkaniyê;
ji axa ser sînga te ye...

Hîn jî;
çavên mişextiyan...
li vegera li ba te ye.

Ayînek, di çav de maye,
ew ayîna
bejna
te ye..

* * * *

Institut Kurde de Paris

jiyan

Institut kurde de Paris

DILBER Û EVÎNDAR

Dilber... li hêviyê ma û ma.. gelek zivistan bi ser de hatin... di bin sur û seqemê de... tertên qeşayê... li ser sînga wê stûr bûn... lê, li bendê ma û ma û çavên wê vekirî man.. li çavnêrî hatina wî..

Evîndar... dema hat û çav pê ket, xwe li dora wê sot û sot, ta qatên qeşayê ji ser sînga wê heland...

Evîndar... bû komek rijî, ta ku tihin da nav û dilê wê.

Institut kurde de Paris

* * * *

RASTÎ

Dema mirov pir digrî... mirov hinekî ji roniya çavên xwe winda dike.

Dema mirov birçî dimîne... mirov hinekî ji goştê laşê xwe winda dike.

Dema mirov xizan dibe mirov gelek dost û hevalên xwe winda dike.

Dema mirov evînê ji hundirê xwe diqewirîne... mirov, xwe jî pêre winda dike...

Institut kurde de Paris



* * * *

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

HÊSIRÊN MIN

Dakevin.. dakevin hêsirên minî biha, dakevin.. bi serbestî dakevin, bibin co û cobar.. û bi ser riwê min de werin xwar..

Dakevin.. xwe berdin ser dil û kezebê.. wan bişon ji şemala evîna winda.. evîna bê reng û rû.. bê dest û ling.. bê laş û serî..

Belê, hêsirên min dakevin.. zelal û bi hêrs, weke ava kaniyên me.

Bi eşkere êdî dakevin.. bê tirs.. bê pirs.. bê hêvî.. bê evîn, bê gilih û gazind..

Dakevin.. hêsirên minî xudayî, hewe tenê tu carî dev ji min berneda, ne di tengiyê de û ne jî di firehiyê de.... tu caran hewe xap û derew li min nekirin...

Êdî xweş bawerim... ez û hûn bi hev re çêbûne... û dê bi hev re jî bimrin.

* * * *

Institut kurde de Paris

DAYÊ

Lê dayê... zaroka biçûk, dema digrî.. ta pêsîra dayika wê nekeve devê wê naletihe...

Lê dayê... zikê birçî tarihe dike kefte–left, ta ku nan nexwe nahedine...

Lê dayê... Birîndarê di nexweşxanê de, dike nalenal, ta birînên wî derman nebin, çavên wî nakevin hev, û xewê nabîne...

Lê dayê... Ez birçiyê rastiyê me kanî nan...

Lê dayê, Ez tihnê azadiyê me kanî av.

Girtiyê zêndan û çala me–Lê dayê–kanî tav.

Institut kurde de Paris

* * * *

Naxwazim

Çibkim ji dilê bê evînî

Çibkim ji destê ne nivîsînî

Çibkim ji çavên min negrînî

Çibkim ji hişê ku ne bidê

Ù

ne bistînî.....

Institut kurde de Paris

* HER ŞEVEK PIŞTÎ WÊ ROJE *

Ey balgehê min... berê ber gora min... gazinda ji min neke... dizanim ku tu ji danîn û hilanîna serê min westihayî.

Ey mitêla min... ferşê ser sînga min.. bibûre... dizanim ku tu ji avêtin û anînê.. westihayî...

Doşeka min, tu jî bibûre... dizanim ku hirya te ji xwihdana min tête strian...

Lê, gazindên min û hewe ji vê şeva reş û dirêje...

Ey şeva reş û dirêj.. tu xweş dizane, ta ku çavên min rojê nebînin, nakevin hev... narazin... namirin... lê bizane... tu çiqas dirêjbî, tu ne bê dawiye... diyare ji min... şefeq nêzîk bûye... êdî xweş bawerim, ta ku xwîn û xwihdan di laşê min de hebin, dê bikoşe.. devê minî tehl û ziwa nêzîke ku şerbeta xweş binoşe.. ji bîr nebî, her şevek pişti wê roje.

* * * *

Institut kurde de Paris

POSTA ME

Herşev, heyva me, bi tîrêjên roniya xwe re, bihna ax û av û darên te– ey welatê min–hildigre û ji min re tîne, û ji ba min jî bêhn û bêhrî û kovanên min ji te re tîne.

Belê, ta ku heyv posta me ye... ji destbirrînê natirsim... tu kes nikare çavnêriya gavên wê bike.. tu kes nikare di devê riya wê de raweste,.. di ser sînoran re gav dide... berikên dijminan naghêjinê... bejna wê ji hemû zindanên kûr û dirêj bilindtire.

Herê, ez xweş bawerim, ku heyva me di navbera çavên minî bi bêhrî û bejna te de, dê here–were, ta ku destên me dîsan bighêjine hev, ji ber ku ew tenê bi evîna me dizanê, ji biçûkaniyê ve... ji zayînê ve...

Hemî raz û sawîr û xewnên me di bin çengê wê de veşartî ne.

* * * *

Institut kurde de Paris

LEHINGÊN XEMKÊŞIYÊ

Sibeh ekê... ji xew rabûm... û weke her car, dîsa kela bêhriya diya min û welatê min, li min dan...

Min destê xwe li ber riwê xwe danî..

Ramanekê ez birim û yekê ez anîm... kela girî êrîş da min... ji nişkê ve dengek hate guhê min dibêje..Heger tu kovandarê milletekî û welatekî û dayikekê yî... gelo tu çi ji min re dibêjî, ku min kul û derdên cîhanê hemî di nava sîng û dilê xwe de hilgirtine... derî li ser wan girtiye.

Ez ji van peyvan mat mam Min baş li vî dengî guhdarî kir, min got:

Gelo kiye.. ? Qey hinek hene derdên wan ji yên min pirtirin.. ?

Dîsa li min vegerand û got :

Belê ez im... pertûkxane ya te me... !! Deriyê sînga min veke û binêre. !!

Dema Li xwe zîvirîm, û min berê xwe dayê.. min deriyê sînga wê vekir.. ez çi

Institut kurde de Paris

bibînim.. !! Min dît..

XANÎ ji sedê salan ve derdê ji hevketina milletê kurd dikêşe.. bi kalîn û nalîn bi yekîtiya kurda bangdike..

Ger dê hebûya me itifaqek
Vêkra bikira me inqiyadek

Tekmîl dikirî me dîn û dewlet
Tehsîl dikirî me i'lm û hikmet

Temyîz dibiwin ji hev meqalat
Mimtaz dibiwin xudan kemalat

Ji alîkî dî min dît..min dît Cizîrî ji sedê salan ve di agirê evîna Selma de dişewite.. hîn dû bi ser çavên wî dikeve hîn û hîn bendewarê dîtina Selma ye :

Gelo dîsa bibînim, ez
çirayê wes letê hilbit

bisojim şibhê perwanê,
di ber wê nûr û şewqê de

Ji alîkî min dît ku Memê Alan di zindana

Institut kurde de Paris

Mîrê Botan de xwînê ji dev û pozê xwe tavêje û li ser devê çalê, Zînê xwe xemilandiye.. hatiye da xatirên xwe yên dawî jê bixwaze.

Li rexeke dî min dît ku kawayê hesinkar, rahiştiye mîkutê xwe... û kelha zordariyê hildiweşîne...

Ji alîkî dî ve min nêrî... min dît ku Ceger-xwîn nav di xwe dide... dibêje :

kî me ez...

Kurdê kurdistan... kurdê serfiraz,dijminê dijmin... dostê haştî xwaz,lê çibkim, bêşer,

Dijimin naçî der...

Ji alîkî dî min dît ku Zenbîl—froş zenbîlên xwe li milê xwe kirine... li kolanan digerîne... ji bo nanê zarokan bicivîne...

lê xatûn ji pencera qesrê wî dibîne û ban dikiyê... bi fermanî wî ji can û dilê xwe re dixwaze...

Min berê xwe da Bêkes û min jê re got : vegere welêt... êdî tu ne bêkesî kesên te vane xuyane.. bilindin wek çiyane...

Min dît, ji qata nêvî Resûl Hemzatof

Institut kurde de Paris

bandike û dibêje : Temîniya min li we be.. dema ez bimrim... û hûn min veşêrin.. axê li ser guhê min stûr nekin... dema dawet û şahî li gundê me çêbibin... ji bo dengê tenbûrê xweş–xweş bikeve guhê min.

Min dît ku yilmaz, bihin çikihayî ji hebs û zindanên faşistan dibeze–xwe li deryayên cîhanê dide, rahiştiye tûrê êş û jana miletê xwe da bighîne hemî milletên cîhanê...

Waye, lorka pêxwas li pêşiya miletê ispanî bazdide... xwîna. birînên xwe li dû xwe dike rêçeke azadiyê da miletê wî bide ser.

Cewahirî ji qata jorîn dibêje : Miletê ku stûna wî xwîn û serî bin; ger kesek nemîne dê ew bimîne...

Piştî ku min guhdarî dengê wan lehingên xemkêşiyê kir... vîna min xurt bû.. min pişta xwe da wan û hêdîka vegereham, pertûkxanê dîsa ban min kir û got...

Bizanibe ez bi barê xwe bextiyarim û ji bîr neke.. Herçî kesê êşa mirovan nekêşe, ew ne mirove.

* * * *

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

GELO KIYE..!?

Ji zingilê derî ditirsim.. her ku zingilê derî tête lêdan.. dilê min bi xurtî lê dide... bi sedê ramanan di wê bihnê de di serê min de digerin... ji xwe re dibêjim...

Gelo evê li zingil dide kiye..?!

Gelo wê rêwîyek nenas be, pirsa xwediyê xwe yên windia bike?

yan wê berîd be, nameyekê bi de min?

yan wê hevalek be ji cihekî dûr tê, ji zû ve me hev ne dîtiye..?.

Na... çima wê ne kerteke dawetê be.. yan şahiyê be..?

yan.. xwedê nekê–xwedê nekê... ev kesê tiliya wî li ser zingil.. gotinek ne xweş pê re be... mirina nasekî.. mirovekî... hevalekî hêja...?

Wî rebenê, xwedê neke, tiştek bi serê zarokên min ne hatibe?! Ma hema hêvî xwedê ye... yek ji welatê min hatibe da tiştên 26salan ji min winda bûyîn hemiyan.. ji min

Institut kurde de Paris

re bêje..

Lê di dawiyê de, neçarim... ezê derî vekim... û dê bispêrim xweda...!!

Ji ber ku, yê ku li zingil dixe... ew kîbe,û ji bo çi hatibe... dê ew be... tiştek nayête guhertin...!!.

* * * *

Institut kurde de Paris

Jiyan

Institut kurde de Paris

JI BO KEÇA MIN

* * * *

* JIYAN *

* * * *

Jiyan...

sê behir ji temenê min

gorî te bibe...

behra mayî

ji min re be...

da

ez te têr

tê de bibînim...

Institut kurde de Paris

* * * *

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

BIHARA MIN

Dîsa bihar hat... tîrêjên tavê riwê qadê diramûsin, û xwe diberdin nava dilê wê... rehên qadê germ dibin... dijenin, zêndî hemî xwe vedizelênin... çavên xwe.. ji xewa dûv–dirêj mist didin... li ber xwe didin, da rêçeke nû ji jiyanê re vekin... Teyr û tilûr vediciniqin... ji qelşên teht û daran têne der... pirtikên kevin tavêjin... xwe renge–reng dixemilînin...

dest bi avakirina hêlînan dikin...

dest bi evîneke nû dikin da jiyaneke nû bijîn... dar û devî şaxên xwe vediweşînin... tîrêjên tavê himbêz dikin, wê tirs û lerza zivistanê ji dilê xwe diqewirînin... kara guhertina rengê xweristê dikin...

Zarok dadikevin hola leystikê ji girtina malê aza dibin.. gul û kulîlk vedibin... bi niyazî xwe li ba dikin... û çavên wan li riya evîndaran dimîne...

Belê bihar hat, û akama şemala xwe li her der û kesî kir...

Institut Kurde de Paris

Belê bihar hat, û va dê here jî... lê newêrî riya xwe bi depê sînga te xîne... newêrî xwe berdê nava wê kelha kevnare... ji rengê wan daran ditirsiha.... fedîkar bû ji riwê wan zarokan...

Tirsiha ku ji agirê dilê wan dayikan bişewite...

Belê... biharê dizanî ku qada te qadeke taybetiye, birîna te birîneke taybetiye... ne wek hemî birînaye, qadek taybetiye... ne wek hemî qadaye, ji lewra biharekê dixwaze lê ne wekî hemî bihara ye.

- 1991 -

Institut kurde de Paris

* * * *

BEHRA BINDESTAN

* *Şeva reş,*

hevalê dizaye...

* *Ziman,*

çekê bê bextaye...

* *Xewnên mezin,*

semyanê bê kêraye ,

* *çavne biwarî û berberîtî,*

behra bindestaye...

Institut kurde de Paris

* * * *

AX--- --- !!

AX ax... gelo me tu carî ji xwe pirsiye... ev gotina han... ya ku bi me re dibe heval, ji roja ku zimanê me li peyvê vedibe, û ẗeta peyva dawî di jiyana mirov de... her mirov dibêje... AX...AX

gelo ev ji çi tê...?.

Ku mirov diçe nav goristanê... mirov dibîne ku ev pirs bixwe bersiva xwe dide...

Mirov dibîne... Bajarekî mezine ẗeta tu bêje fireh û mezine... bajareke kerre... bê denge... bê gilih û gazinde, bê cenge.. bê zikreşî.. berberî û bê cirîde... bê hest.. bê hêvî... û bê kul û bêhriye...

Wê çaxê mirov dizane ku ew hêviyên pêknehatî... ew birînên ku tu derman li wan nehatî... ew kovan û bêhriyên xwediyên xwe şewitandîn, hemî li benda wê axê bûn... axa sar.

Ey axa Xwedayî... ey deşta ne serî û ne

Institut kurde de Paris

dawî... li me bibûre, ku em xwe jibîr dikin... bi payetî pêl sînga te dikin... hêvîdarin ku tu weke me bi me re nekê... dilovan bî bi me re.. ey lêvegera me ya dawî... dilovan bî bi me re, dema tu bikevî bin neynûkên me, bikevî dev û guh û çavên me... dilovanbî bi me re; dema tu li me bê hev wek zikê diya me...

Bibûre li me bibûre,

ey gotina mezin...

ey rastiya tazî...

ey doşek û mitêla maldar û xizana...

Institut Kurde de Paris

* * * *

ZAYÎN

Ey kehniyên ziwabûyîn ji tihna...

Ey şaxên qurmiçandî...

Ey kulîlkên bihar jibîrkirî...

Ey şikeftên kul û derdan...

Ey çiyayên bê xew...

Diyare îro dîroka derewa dilerize, pelên wê yên rizî diwerihin...

Ji ber ku îro ...

zayîneke nuhe...

jiyaneke nuhe...

ji lewra pêdiviye ku îro ...

dîrokeke nû bête danîn...

19 – 5 – 1992

* * * *

Institut kurde de Paris

AXA WELAT

Axa welat qet nayête jibîrkirin... dê çawa ji bîra me herê.? dema em ji dayika xwe bûn... em ketin ser wê axê, dema bi çarlepka çûn, me ew ax tavête devê xwe... me xweştir didît ji kakilên gwîz û bindeq û bihîvan.

Dema em li ser piyan ketin. evîna lîstikê li serê me da, me xwe di nav wê axê de digevazt.. me xanîtilok jê çêdikirin... ẍar û deqîlok û ferşik jê çêdikirin... dikete bin neynûkên me... dikete kehniyokên çavên me... di nav porê serê me, di nav qermûçekên çermê me de... û xwe pêre diberda nav hest û dil û xwînê.. ta bû behrek ji can û laşê me...

ji lewra, dema mirovek li biyaniyê dimre... temîniyê dike; ku wî di nav axa welatê wî de veşêrin... ji ber ku ew bawere... ku axa welat dê li cendekê wî dilovan be... pir nagvêşîne... naêşîne...

Dema lingin çepel pêli axa welat dikin..

Institut kurde de Paris

qayil nabe bi tu avî xwe bişo... ji bilî xwîna zarokên xwe pêve... ji lewra... hingî welat şêrîne... şêraniya wî dide ser hemî tiştên şêrîn...

bihayê wî dide ser hemî tiştên. biha

evîna wî dide ser hemî rengên evînê... !

* * * *

Institut kurde de Paris

WELATÊ MiN

Ji ber ku pêtên evîna te di dilê min de ji karîna min bilindtirbû, min ji te bazda û bazda, ez çûm û çûm..

Min gelek deşt û beyar qetandin, ez çûm û çûm ta bihna min çikiha, û xwihdana min ziwa bû, ez rawesteham, min li dora xwe nêrî, ez çi bibînim.. !! Min dît ku ez hîn di nava reşika çavên te de li dora xwe dizî-virim...

Min dîsa dawtêlên xwe li xwe pêça, û min bazda û bazda..min deşt û çiya.. bajar û gund.. bej û deryayên cîhanê hemî birrîn... û ez çûm û çûm..ta ez giham dawiya sînorê cîhanê..

Li ser piyê kendalekî.. li bin siha darekê.. min kolek ji xwe re çêkir...Ez di bin de rûniştim, min li dora xwe nêrî.. ez çi bibînim.. !!

Min dît ku hîn û hîn di nava mista destê te de.. li dora xwe dizîvirim

* * * *

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Institut Kurde de Paris

SERNAMEYA JIYANÊ

Gazinda ji min neke, Dayê,
dixwzim pesnê te bidim...
Lê gotin hemî bê bihane..
Çendî li tîpan digerim
tev fedîkar û windane..
ma ez dikarim çi bêjim
cîhan ji te dest pê dike..
navê te bi xwe
JIYANE...

* * * *

Institut kurde de Paris

FERIŞT

Riwê zarokan, yeke, ji hundirê wan re weke neynikêye... daxwazên wan eşkere dike.

Ramanên wan, li gorî wan in.. xewnên wan rengînin... Radiperin da ku destên xwe bavêjin heyvê... bi dûv pirpirîkan de dibezin... cilên wan li keleman d'alihin.. li kevir û kortikan dilukumin... bi ser riwê xwe de dikevin... mûç û enîşkên wan xwîn dibin.. digrîn lê,dîsa didin xwe û radibin.. dikenin û baz didin.. zelalin mîna ava bîbokê.Rok li ser dengê wan şiyar dibe... kenê wan ji dile.. evîna wan ji dile.. cîhan bi xwe lîstikeke di nav lîstikên wan de... xap û derewan nasnakin,reş û sipî ji hev cuda nakin....

Xwezî ewa bizanîbana ... ku her çend dixwazin zû mezin bibin... bi sed car hewqas mezin xweziya xwe bi wan tînin.

* * * *

Institut kurde de Paris

BIBÛRIN

Bibûrin...

Navên paytextên welatan ne jiberim...
Navên zana û serokên cîhanê ne jiberim..
çiqas ceng di cîhanê de çêbûne;

dîrokên wan ne jiberim ...

Navên nivîskarên cîhanî ne jiberim...

navên çiya û deryayên cîhanê ne jiberim.

Lê....

ew zeviyên min nan ji wan xwarî...

ew kehniyên min av ji wan vexwarî...

ji bîr nakim...

Qelşên derî... fîze–fîza bayê

ji bîr nakim..

Bivir... das û tefşo, gêsin û nîr

ji bîr nakim...

Institut kurde de Paris

Benikê çaroxa gavên dengê bilûra şivên

jibîr nakim...

Jibîr nakim, rengê kirasê diya xwe...

Bihna axê jibîr nakim...

gurme-gurma potîna cendirma... dijûnên

wan, rêveçûna wan di kolanên gundê me de

jibîr nakim...

Cihê goristanên bê kêl jibîr nakim.

Ew kehniyên ziwa bûyîn ji tihna...

jibîr nakim...

Ew dest û riwên biraştî... lorikên dayikan

jibîr nakim...

Çîrok û şîret û serpêhatî... gotinên pêşiyan...

na *—tu carî— jibîr nakim.*

* * * *

Institut Kurde de Paris

WELATÊ MIN

DÊ TU HEBÎ

Dê tu hebî
ta ku ba
pelê dara
dihejîne.

Dê tu hebî
ta ku dayik
lendana xwe
dilorîne.

Dê tu hebî
ta ku cîhan
çar kirasan
dugherîne.

Dê tu hebî
ta ku dil
piyana xwîne.

Institut kurde de Paris

Dê tu hebî

ta ku nêrgiz

bi hilm û bîne.

Dê tu hebî

ta ku cotkar

tov li qadê

direşîne.

Dê tu hebî

ta ku ji kurdan

çêdibin

Ceger–Xwîne.

Institut kurde de Paris

* * * *

BANGA SIBEHÊ

Ciqasî didim xwe da zincîrên dest û piyên xwe bişkînim... pirtir di goştê laşê min de têne çandin... ta dighêjin hestiyê min...

Bi çarpiya diçim da ji hundirê xwe yê teng û tarî derkevim û bibînim; ka çi li derve heye û çawaye..

Bi kefteleft dighêji me devê derî..

berî ku destê xwe bavêjim destikê derî da vekim, sedê destan bi hev re min bi şûn ve tavêjin, û min li bin guhê çar dîwaran didin...

her dîwarek min ji yê dîre tavêje ta ku ji hev bela—wela dibim..

Lê, dîsa dema dîwar Ker dibin û dergevan diwestihin... û gêj dibin..

Dîsa perçên xwe didim ser hev û birînên xwe didrûm.

Institut Kurde de Paris

Dîsa bi zikxişkî ber bi derî ve diçim di cihê kilîtê re dinêrim..

Ho.. ho çi bibînim, ku ne dergehekî bi tenê li ber min girtiye... her dergehek bi sedên dergehan di pişt wî de hene, û her nifşek ji dergevanan bi sedê nifşan bi dûv wan de hene..

Ho ho.. ho ho li min û halê min bê, min digot.. qey yek derî bi tenê li min girtiye, û min digot qey dergevanekî kaxetî li pişt deriye... dê dilê xwe bikim topek ji agir û bavêjim van dîwaran... biherêfim... van bend û zincîr û sînoran biheşêfim..

Min ne dizanî ku berî çêbibim, cihê min pîvaye.. gora min kolaye..behra min xuyaye....

Bi vê kefteleftê... bi vê dan û standina min bi dîwarên zindanê re... bi dengê xermişandina neynûkên min li ser deryê hesinî re.... hindek bîranînên biçûkahiyê, çingînî ji guhên min anîn...

Institut Kurde de Paris

..... !! Hate bîra min dema keçik çêdibûn... pîrik ne dikenî... kesî ne dilîland... diyarî ji keçikê re nedihatin.

Dema digriya... digotin; neçin pêve bila bigrî.. wê bi niyazî xwedî nekin,keçe,zû bi zû namire... kitika Heftruhe...

Keçên serreşin, tovê perparêne... warê keça kore.. çiqa mirov wan bi xwedî bike ji xelkê re ne... xwedê wan pir neke.

Hîn evan bîranînên kevne–nuh, mejiyê min dikolan... ez veciniqîm bi dengê banga dîkê sibehê dibêje:

Herçî kesên razayî rabin,bese xew.!!

Institut Kurde de Paris

* * * *

Institut kurde de Paris

NAVEROK

Diyarî 5
Sipasî 7
Pêşgotin 9
Ev pertûk 19
Dilê min 21
Biyanî 22
Piştî ku gundê me ma vala 23
Xwezî ez 27
Ey çiya 33
Xewna min î zikmakî 35
Evîndarê ku ez dixwazim 37
Çend ayîn 39
Çiya perestim 41
Sûnda min 42
Dilber û evîndar 45
Rastî 46
Hêsirên min 49
Dayê 50
Naxwazim 51
Her şevek piştî wê rojê 52
Posta me 53

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Lehengên xemkêşiyê 54
Gelo kiye !?..... 61
Ji bo keça min Jiyan 65
Bihara min 69
Behra bindestan 71
Ax...!! 72
Zayîn 74
Axa welat 75
Welatê min 77
Sernameya jiyanê 81
Ferişt 82
Bibûrin 83
Dê tu hebî 85
Banga sibehê 87

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Pênûsa ku ji bo welatê min nenivîsîne bila bişkê.

Zimanê ku ji bo welatê min nepeyive bila jê bibe.

Çavê ku rewşa welatê min nebîne bila kor bibe.

Guhê ku nalîna welatê min nebihîze bila ker bibe.

Zendê ku ji bo welatê min neheje bila [illegible]

Lingê ku ji bo welatê min rênese bila [illegible] bibe.

[illegible]

Xwîna ku ji bo welatê min pêl nede bila zuha [illegible]

Dilê ku ji evîna welatê min nebe agir bila raweste û bimre.

Bi kurtî mirovê ku ne ji bo welat be bila tunebe.

Diya Ciwan

---

* *Di kurdî de [illegible]*

Institut kurde de Paris

K.L. 2